**Li Tirkîyeyê du hefteyên dawîn**

**1-15 Cotmeh 2022**

**1ê Cotmehê, 2022**

**Nehiştin ku Endamên Egitim-Senê têkevin Meclîsê**

Endamên Sendîkaya Kedkarên Perwerde û Zanistê (Egitim-Sen) da ku îmzeyên ku ji bo betalkirina Qanûna Pîşe ya Mamostetiyê (ÖMK) berhev kiribûn, pêşkêşî meclîsê bikin, li Deriyê Çankayayê yê Meclîsê kom bûn.

Serokê Meclîsê Mustafa Şentop bi hinceta "Rûniştina taybet" û " vekirina Sala nû ya zagonsaziyê" têketina Meclîsê qedexe kir. Seroka giştî ya Egitim-Senê Nejla Kurul bertek nîşan da û got, "Li meclîsê wekîlên me hene, lê gel nikare bikevê."

Ji ber ku bi sendîkayên perwerdehiyê neşêwirîn, Egitim-Sen li dijî pêşnûmeya qanûnê derdikeve. Ev qanûn dibe sedem ku meaşên “mamosteyên pispor" û "ser-mamoste"yan ji yên mamosteyên heman karî dikin cuda bin. Bi vê qanûnê îmtîhana mamosteyên berendam rakirin û li şûna wê komîsyona nirxandinê anîn û ev yek jî mekanîzmayeke ava dike ku ji torpîlê re vekirî ye.

**2ê Cotmehê, 2022**

**Li Enqereyê di çalakiya ji bo Mahsa Emînî de 9 jin hatin binçavkirin**

Platforma Jinan a Enqereyê xwest ku ji bo Mahsa Aminî ya ku li Îranê bi hinceta beşek ji porê wê xuya ye ji aliyê polîsên exlaqê ve bi lêdanê hat qetilkirin, daxuyaniya çapemeniyê bidin. Koma jinan rastî mudaxeleya polîsan hat. Polîsan 4 jê hemwelatiyên Îranê bi giştî 9 jin binçav kirin. Polîsan hin jin bi erdê re kaş kirin û birin wesayîta binçavkirinê. Polîsan ji bo rojnameger wêneyan nekişînin barîkatên bi mertal danîn.

Kesên hatin binçavkirin bi îdiaya ku “li dijî Qanûna Civîn û Xwepêşandanan a bi jimareya 2911an derketine” û “li hemberî memûrê berpirsyar li ber xwe dane” hatin sûcdarkirin.

Kesên ku hatin binçavkirin danê êvarê piştî ku li Midûriyeta Şaxa Ewlehiyê ya Midûriyeta Ewlekariya Enqereyê îfade dan, hatin berdan. 4 hemwelatiyên Îranê teslîmî Midûriyeta Şaxa Têkoşîna li Dijî Qaçaxçîtiya Koçberan hatin kirin. Çar jinên Îranî di bin metirsiya dersînorkirinê de ne.

**5ê Cotmehê, 2022**

**Dadgehê tu rê tê de nedît ku 2 rojnamegeran sûcdar bikin, biryar da ku ew "ji bo dewlet û civakê xeternak in"**

22yemîn Dadgeha Cezayên Giran a Stenbolê ji "endamtiya rêxistina terorê" 6 sal û 3 meh cezayê girtîgehê li nûçegihanên Ajansa Mezopotamyayê yên berê Sadiye Eser û Sadik Topaloglu birîn.

Dadgehê qebûl kir ku ne bi delîlên berbiçav, lê li gorî qinyatê cezayê girtîgehê daye.

Di daxuyaniyê de hat gotin ku "ji ber ku her du rojnameger endamê rêxistineke ne ku ji bo dewlet û civakê xeternak tê dîtin divê bê cezakirin".

Sadiye Eser û Sadık Topaloglu di çarçoveya lêpirsîna ku Serdozgeriya Komarê ya Stenbolê dimeşîne di 29ê Mijdara 2019an de li Stenbolê hatibûn binçavkirin. Rojnameger di danişîna ewil a ku di 26ê Adarê de li 22yemîn Dadgeha Cezayên Giran a Stenbolê hat dîtin de serbest hatin berdan û negirtî dihatin darizandin.

**Karkerên Tekstîlê yên EFTê ji ber ku mafên xwe xwestin hatin binçavkirin**

Karkerên tekstîlê ji ber ku destheqên wan hatiye çopandin 76 roj in li ber xwe didin. Karkeran xwest ku li ber Qesra Çiraganê ya li Stenbolê ku 15emîn Konferansa Cil û bergên Amade lê tê lidarxistin, daxuyanî bidin çapemeniyê. Polîsên ku destûr nedan daxuyaniya çapemeniyê 21 karker binçav kirin. Karkerên hatin binçavkirin danê êvarî piştî ku îfadeyên wan hatin girtin, serbest hatin berdan.

Konferansa Cilûbergan ji aliyê Komeleya Çêkerên Cilûbergan ênTirkiyeyê ve dihat organîzekirin û seroka komeleyê, xwedîya EFT Tekstilê Sanem Dîkmen e.

Fabrîqeya Tekstîlê ya EFTê ku li Taxa Tepeoren a navçeya Tuzlaya Stenbolê fealiyet nîşan dida daxuyand ku dê di 31ê tîrmehê de bê girtin û destnîşan kir ku ew ê beşek piçûk ji mafên karkerên ku li fabrîqeyê dixebitin wek ikramiye, meaş û tezmîneta qidemê bidin. Li ser vê yekê 10 roj beriya girtina fabrîqeyê karkerên ji Sendîkaya Karkerên Çerm, Tevn û Tekstîlê (DERITEKS) a girêdayî Turk-Işê xebata xwe sekinandin û dest bi çalakiyê kirin.

**9ê Cotmehê, 2022**

**Meşa HDPê hat astengkirin, lingê parlamenter Habip Eksik hat şikandin**

Di meşên ku Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) bi sernavê "Em ber bi azadiyê ve dimeşin" li dar dixe de, 138 kes hatin binçavkirin. Di mudaxeleya polîsan a li Geverê de lingê Parlamenterê HDPê Habip Eksik şikiya. Di daxuyaniya walîtiyê de hat gotin ku "Wekîlan di dema meşê de ji bo feraseteke çêkin xwe avêtin erdê". Habip Eksik ragihand ku polîsan "bi mebesta birîndarkirinê li erdê li wî xistiye". Ji bilî Amedê kesên ku hatibûn binçavkirin serbest hatin berdan.

Di nav kesên li Stenbol û Colemêrgê hatin binçavkirin de 4 nûçegihanên JINNEWS û Ajansa Nûçeyan a Mezopotamyayê jî hebûn.

Çalakiya "Em ber bi azadiyê ve dimeşin" bi wesîleya 23emîn salvegera derxistina rêberê PKKyê Abdullah Ocalan a ji Sûriyeyê pêk hat. Ocalan piştî destwerdanên hikûmeta Sûriyeyê neçar ma ku ji Şamê derkeve. Wî li gelek welatên wekî Rûsya, Yewnanîstan û Îtalyayê daxwaza penaberiya siyasî kir, lê ev daxwaz nehat qebûlkirin. Ev pêvajoya ku 129 rojan dewam kir, di 15ê Sibata 1999an de dema Ocalan li Nairobiya paytexta Kenyayê hat girtin bi dawî bû. Piştre, Ocalan anin Tirkiyeyê.

**10ê Cotmehê, 2022**

**Cezayê girtîgehê li xebatkarê berê yê Pegasusê birîn ji ber ku wêneyê xwe yê bi araqê parve kiriye.**

Ji ber parvekirinên wî yên li ser medyaya civakî yên di Şeva Qedrê de, 3 meh û 22 roj cezayê girtîgehê li xebatkarê berê yê Rêhewaya Pegasusê yê bi navê Onur T.  hat birîn.

Onur T. di şeva Qedrê de wêneyê xwe yî li dor maseya alkolê kişandiye, bi nivîsa "Şeva Qedrê taybet e, Rebbê min qebûl bike" li ser medyaya civakî parve kir. Li ser vê yekê bi hinceta ku "bi eşkere heqaret li nirxên ku ji aliyê gel ve tên pejirandin kiriye" bi daxwaza cezayê girtîgehê hat darizandin.

Onur T. roja din piştî vê parvekirinê di şeva 27ê Nîsana 2022an de ji hêla Rêhewaya Pegasusê ve ji kar hatibû avêtin.

**12ê Cotmehê, 2022**

**"Miss Uganda Esenyurt" bi hinceta ku ne li gorî kevneşopiyan e hat betalkirin**

Pêşbirka bedewiyê ya bi navê "Miss Uganda Esenyurt" ku di çarçoveya Festîvala Çandên Xwişkûbiratîyê de li Esenyurt a Stenbolê dê bihata lidarxistin, ji aliyê qeymeqamiyê ve bi hinceta ku “ne li gorî urf û adetên tirkan e" hat betalkirin.

Çalakî bi hevkariya şaredarî û Yekîtiya Komeleyên Parêzgehê dê bihata organîzekirin. Betalkirin ji aliyê Qeymeqamiya Esenyurtê ve bi devkî ji Serokê Yekîtiya Komeleyên Parêzgehê re hat ragihandin. Yekem pêşbirka bedewiya Miss Uganda Esenyurt di 14ê Mijdara 2020an de, li gel qedexeyên pandemîyê hat lidarxistin û bû sedema nîqaşan di nav gel de.

**Ji Seroka Şaxa Enqereyê ya TGSyê, Sibel Hurtaşê re ketina Meclîsa Mezin a Tirkiyeyê hat qedexekirin.**

Seroka Sendîkaya Rojnamegerên Tirkiyeyê (TGS) ya Şaxa Enqereyê Rojnameger Sibel Hurtaş xwest ku li pêşnûmeya qanûna sansurê ya li Meclisa Mezin a Tirkiyeyê (TBMM) temaşe bike, lê belê ketina wê ya meclîsê nehat pejirandin. Hurtaş di îfadeya xwe de diyar kir ku polîsan jê re gotiye ku ketina wê ya TBMMyê hatiye qedexekirin.

Di daxuyaniya TGSyê de wiha hat gotin: “Beriya ku qanûna sansurê were derxistin qedexe dest pê kirin. Em ê bêdeng nemînin."

**13ê Cotmehê, 2022**

**"Qanûna sansurê" ku hikûmetê li dijî dezenformasyonê amade kiribû li Meclîsê hat qebûlkirin**

Pêşnîyara Qanûnê ku der barê guherandina Qanûna Çapemeniyê û hin qanûnan de ye li Lijneya Giştî ya TBMMyê hat qebûlkirin û bû qanûn. Hikûmetê ev qanûn wekî “Têkoşîna li dijî Dezenformasyonê" û muxafeletê jî wekî "Qanûna Sansûrê" bi nav kiribû.

Qanûn ji aliyê Partiya Edalet û Geşepêdanê (AKP) û Partiya Tevgera Neteweperest (MHP) ve hatiye amadekirin. Hinceta qanûnê wekî "pêşîlêgirtina li birêvebirina têgihiştinê ya bi derewan a li ser medyaya civakî" hat ravekirin.

Li gorî qanûnê, li kesên ku bi awayekî eşkere der barê ewlekariya navxweyî û derve, nîzama giştî û tenduristiya giştî de, bi mebesta pêkanîna tirs an jî panîkê di nav gel de, ji bo xêrakirina aramiya giştî, agahiyên derew belav bikin, dê ji salekê heta 3 salan cezayê girtîgehê bê birîn.

Eger sûcdar bi veşartina nasnameya xwe ya rastîn an jî di çarçoveya xebatên rêxistinê de sûc bike, dê ev ceza zêde bibe.

Dibe ku biryar were girtin ku bandên peydekerên tora civakî yên ku ne li gorî daxwazên dozgerî û dadgehan in werin tengkirin; Dibe ku heta 6 mehan qedexeya reklamê li ser pêydekerên torên civakî yên ji derveyî welat weşanê dikin were danîn.

**Biryara îxrackirina dadgerê ku beşdarî meşa Geziyê bûbû hat betalkirin.**

Dadger Tuncay Elarslan di sala 2016an de bi biryara Lijneya Bilind a Dadger û Dozgeran (HSYK) bi sedema ku endamê Yekitiya Dadger û Dozgeran (YARSAV) e û beşdarî berxwedana Geziyê bûye, bi hinceta "têkilî û girêdayîbûna bi FETOyê re" ji karê xwe hat ixrackirin.

Biryara îxracê ji aliyê Şûraya Dewletê ve hat betalkirin. Dozê şeş salan berdewam kir. Dadgehê biryar da ku "mafên wî yên diravî ku jê bêpar maye tevî faîza qanûnî bê dayîn".

Tuncay Elarslan di sala 2018an de, di doza ku li Dadgeha Cezayê Giran a Entabê bi îdiaya "endamtiya FETOyê" dihat darizandin de bêsûc hat dîtin û berat kir.

**14ê Cotmehê, 2022**

**Tevî biryara betalkirinê ya Şûraya Dewletê, hilweşîna li Tozkoparanê dewam dike, herî kêm 4 kes hatin binçavkirin.**

Tevî biryara betalkirinê ya Şûraya Dewletê, li Taxa Tozkoparan a navçeya Gungorena Stenbolê veguherîna bajarî didome. Niştecihên ku berê jî gelek caran red kiribûn ku ji malên xwe derkevin bi darê zorê ji malên xwe hatin derxistin. Niştecihên taxê piştî ku bihîstin dê di 14ê Cotmeha 2022an de ji bo hilweşandinê ekîb bên Tozkoparanê, biryara berxwedanê da. Li hember berxwedana niştecihan, polîsan deriyên xaniyan şikandin û ketin hundir. 4 kesên ku nexwest ji malên xwe derkevin hatin binçavkirin. Rojnameger Meral Danyıldız a ku hilweşîn dişopand hat binçavkirin û piştre serbest hat berdan.

Taxa Tozkoparanê di sala 2012an de bi biryara Lijneya Wezîran weke herêmeke bi rîsk hatibû îlankirin. Gelê Tozkoparanê bi têkoşîna hiqûqî ev biryar betal kiribû. Biryara ku îro bû sedema hilweşînê jî bi Biryarnameya Serokomariyê ya di 21ê Nîsana 2020an de hat dayîn. Tozkoparan di êvarekê de bi biryarnameyê wekî qada felaketê hat îlankirin û xebatên veguherîna bajarî bi lez û bez dest pê kirin. Lê Tozkoparan di rapora Şaredariya Bajarê Mezin a Stenbolê (IBB) ku qadên birîsk tespît dike de, di nav 11 taxên Gungorenê de di rêza nehan de ye.

Gelê Tozkoparanê jî bi rêyên qanûnî li dijî Biryarnameya Serokomariyê nerazîbûn nîşan da. Di 9ê Tîrmeha 2021an de Şûraya Dewletê biryar da ku biryara destnîşankirina herêmê wekî herêmeke birîsk bê sekinandin. Lêbelê, hilweşandina ji bo veguherîna bajarî berdewam dike.

**Di doza qetilkirina Denîz Poyraz de bi ava şid û bi gaza îsotê êrîşî parêzeran kirin**

6emîn danişîna doza Onur Gencer pêk hat ku di 17ê Hezîrana 2021an de li dijî avahiya Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) a Îzmîrê êrîşa çekdarî pêk anî û endamê partiyê Denîz Poyraz qetil kir. Parêzerên xwedî destûr nehatin qebûlkirin bo rûniştinê. Destûr nedan rojnameger û kesên ku ji bo şopandina dozê hatin ku bikevin salonê.

Serokê Baroya Îzmîrê Ozkan Yucel û parêzerên din ên xwestin bikevin girtîgehê rastî mudaxeleya cendirmeyan hatin. Jendermeyan ji TOMA (Amûra Mudaxeleya Bûyerên Civakî) ava bişid û gaza îsotê avêtin parêzeran.

Parêzerên ku ketin salonê, daxwaza redkirina dadger kirin û dema ev yek nehat qebûlkirin salon terk kirin. Rûniştina dozê bêyî parêzerên gilîker pêk hat. Dema ku parêzerên gilîker ne li hundir bûn heyeta dadgehê li şahidan guhdarî kir û dozger jî nêrîna xwe da. Rûniştina din ji bo 27ê Kanûna 2022an hat taloqkirin.

Doz li 6emîn Dadgeha Cezayê Giran a Îzmîrê dihat dîtin. Di rûniştina pêncemîn a di 12ê Cotmeha 202'an de, serokê dadgehê ragihand ku ew ê mafê axaftinê nede parêzerên xwedî belgeya rayeyê li dû vê yekê alozî derket. Cendirmeyan li birayê Denîz Poyraz ê girtî Kamuran Poyraz xist. Pişt re pevçûn derket û polîsên li salonê gaza bîberê avêtin salona dadgehê. Piştî bêhnvedana danişînê heyeta dadgehê bi hinceta ewlehiya bersûcan biryar da ku rûniştina şeşan di 14ê Cotmeha 2022an de li Kampusa Girtîgeha Şakranê ya Îzmîrê li salona dozê pêk bê.